BILA ERDOGAN JI QIRKIRINA JINÊ BÊ DARIZANDIN!

Ji bo ku Dîktator were darizandin!

100 SEDEM

Di dîroka mirovahiyê de felaketek ji rejîma Dîktator zêdetir zerar nedaye civakê û em vê yekê ji komkujiyên dema nêz nas dikin. Hîtler cihû qir kirin, qirkirina Ermeniyan, dagirkirina Amerîkaya Latîn û qirkirina gelên xwecihî. Li Asya, Rojhilata navîn û li Kurdistanê 200 salên dawî bi awayekî sîstematîk komkujî tên kirin û mirovahiyê serî bi wan felaketan re dernexist.

Li gorî Netewên Yekbûyî qirkirin tê wateya tinekirina zindiyekê, qewmek, baweriyek û fikreke siyasî bi awayekî zanebûn were tinekirin. Dîktator jî wekî rêveberekî ku her tiştî têxe destê xwe di asta herî jor de xwe bi cih bike. Li gorî van pîvanên hiqûqa navnetewî em jî dibêjin Erdogan dîktatoreke û ji ber qirkirina kiriye divê were darizandin û em sedemên wê jî pêşkêş dikin. Lewma ev dîktatorê faşîst û nijadperest xwe xistiye pey wezîfeya serokomarê Tirkiyê û di encamê de bi awayekî eşkere jinên Kurd qetil kir û hê jî qetil dike. Erdogan di desthilatdariya 18 salan a AKP'ê de bi awayekî zanebûn li dijî jinan gelek komkujî,

SAKİNE CANSIZ FÎDAN DOĞAN LEYLA ŞAYLEMEZ HEVRİN KHALAF KEVSER ELTÜRK CEYLAN ÖNKOL
TAYBET İNAN KADER ORTAKAYA SOLİN BEBEK CEMİLE ÇAĞIRGA DERYA KOÇ EYŞÊ EHMET FERHAN
DİLEK DOĞAN ASYA YÜKSEL AQEEDA ALİ OSMAN AMİNA OMAR FATMA UYAR SÊVÊ DEMİR PAKİZE NAYİR
ZEHRA BARKAL BADİA MULLA KHALİL AMİNA WEİSSY HEDİYE ŞEN FATİMA KANNA GÜLİSTAN DOKU
BERJİN DEMİRKAYA HOURİA MUHAMMAD BAKR SONYA ŞEMAL HANİFE ALİ İPEK ER MEDİA KHALİL
NADİRA KADİROVA AMİNA MUHAMMAD MARDİNİ AZİZE CELAL TULANE BERU GOLESTAN HASSAN
LEYLA HANNAN REMZİYE BOR DİLOVAN ISMET RASHİD AYŞE AHMED MUSTAFA KURDİSTAN ABDULA
REZAN HÜSEYİN ASYA ELÎ MİHEMED NARİNÇ FERHAN QASİM EVÎN KAWA MEHMÛD PAKİZE HAZAR
DİLAN KORTAK EYLEM MİHEMED EMER İMAN IBRAHİM JAMİLA VE KHADİJA MUSA POLEN ÜNLÜ
NAZEGÜL BOYRAZ NAZLI AKYÜREK FİKRİYE ECE DİNÇ BÜŞRA METE DUYGU TUNA AYDAN EZGİ SALCI
FERDANE KILIÇ HATİCE EZGİ SADET NURAY KOÇAN BAHARİN PİRNO MALAK NABİH KHALİL JUMA
HEWA EMER HİSÊN EZÎME TAHİR FERMAN HACER ASLAN MERYEM AKYOL GÜLİSTAN ÜSTÜN
SAKİNE SİRAY MERYEM SÜNE ALİYE TİMUR ZUZAN BALU SAWSAN JAMİL SULEİMAN
AL-MAZZA SHEİKHO HORO SULTANAH NASİRU AİSHA HANAN ZAİNAB MUSTAFA MUSA FATİMA OBAİD HAMDAN
SABİHA SİDO SADİQ ZULİKHAN HASAN JUNAİD FERİDE YILDIZ HELİN HASRET ŞEN ROZERİN ÇUKUR
ŞEHRİBAN ALTINIŞIK SELAMET YEŞİLMEN FATİMA HAMAKİ HADYA AHMED MURAD MUSA
LOVİN KHALİL NURİ ZEYNEP TAŞKIN ZEYNEP YILMAZ YASEMİN ÇIKMAZ JOUURYEH ALİ IRFAN
RANİA MUHAMMAD HAMADEH HEVİN MUSTAFA KHLO LAİLA İBRAHİM MAAMOU HANADİ KENO
NAZİ YUSEF YOUSSEF BADRİYA AL-ABDULLAH SAMİRA MUHAMMAD AMİNA MUHAMMAD MUSTAFA

cinayet û tecawuz dan kirin.

Di 9'ê Çileya 2013'an de li Parîsê Sakîne Cansiz, Fîdan Dogan û Leyla Şaylemez qetil kirin. Di Kanûna 2015'an de li Silopyayê Taybet Înan qetil kirin û cenazeyê wê 7 rojan li kolanê hiştin.

Di 4'ê Çileya 2016'an de li Silopyayê aktîvîstên jin Sêvê Demir, Pakîze Nayir û Fatma Ûyar qetil kirin. 12'ê Cotmeha 2019'an li Serêkaniyê Hevrîn Xelef, 29'ê Cotmeha 2019'an zaroka 12 salî Ceylan Onkol, 7'ê Mijdara 2014'an li Kobanê Kader Ortakaya, 18'ê Cotmeha 2015'an Dîlek Dogan li Stenbolê û îsal jî li gundê Helincê yê Kobanê 3 endamên Kongra Star bi sîlehan hatin qetilkirin. Her wiha dehan bûyerên din bi vî rengî.

Dibe ku bi awayekî fîzîkî komkujî lê nehatibe kirin, lê welatekî ku Dîktator lê hebe tê serê her jinê. Şîdet ji sedî hezar zêde bû, tecawuz bi vî rengî, jin têne girtin û ji kar têne avêtin. Gelek bûyerên din bi vî rengî em li lîsteya sûcên Erdogan zêde dikin.

Dehan bûyer û mirin hene ku bi gotinan nayê îfadekirin. Lewma em van bûyeran ne tenê bi belgeyan, di wijdanê xwe de jî qeyd dikin. Em dibêjin ku divê Erdogan niha were darizandin. Di destê me de lîsteya sûcên şer gelek e û em naxwazin ev lîste dirêjtir bibe. Hêrsa me zindî ye û her roj em komkujiyên nû şiyar dibin. Hêza me heye ku em hesab ji vî sûdarî bixwazin. Di destê me de gelek belge û îspat hene. Em dizanin ku ev hemû sûcên şer in.

Wekî Tevgera Jinên Kurd li dijî qirkirina jinê heta niha me gelek kampanya û çalakî kirin. Kampanya me ya nû jî bi navê "Ji bo darizandina Dîktator 100 sedem" e. Em ê bi vê kampanyayê ji failê sereke yên van sûcan ji Erdogan hesab bixwazin. Erdogan di desthilatdariya 18 salan de ne tenê 100, bi sedan sûc kirin. Em dizanin ku heta ev kes neyê darizandin wê wijdanê mirovahiyê rehet nebe.

Wekî Tevgera Jinên Kurd a Ewrûpayê em dizanin ku bi fermana Dîktator Erdogan esker, çete û polîsên wî komkujî kirin û li dijî van komkujiyan bi 100 sedemî em li benda 100 hezar îmze ne. Ev îmze wê bibe gava destpêkê ya darizandina Dîktator. Piştre jî wê çalakiyên me yên hiqûqî, civakî û polîtîk hebin.

Di 25'ê Mijdarê de wê kampanya me dest pê bike û heta 8'ê Adara 2020'an dewam bike. Di qonaxa duyemîn de jî 100 hezar îmzeyên hatine komkirin wê tevî belge û îspatan radestî Netewên Yekbûyî û saziyên

SUAD MIHEMED, dayika Hevrîn Xelef
ku di 12'ê Cotmeha 2019'an hat qetilkirin

pêwendîdar bên kirin. Em ê daxwaz bikin ku feminicid jî wekî qirkirin bê naskirin. Ji ber ku Netewên Yekbûyî karê xwe nekir Erdogan û yên wekî wî cesaretê digrin.

Qonaxa duyemîn a kampanyayê ji 8'ê Adarê heta 25'ê Mijdara 2021'ê ji bo her rojê em ê bêjin sedemek me heye û em ê çîroka wan jinan ji were bêjin. Ew dîktatorê ku her rojê komkujiyek kiriye, em ê jî çîroka wan jinan bi were parve bikin. Em ê bikin ji bo ku neyê jibîrkirin.

Kampanya me ya îmzeyan wê her roj hê bêtir bihêle ku Dîktator were darizandin û bi her çalakiyê wê qada jiyanê li Dîktatoran teng bibe.

Hêza xwe bibin hêza me, dengê xwe bidin dengê me û ji bo ku dîktatoran ji jiyana xwe bavêjin ji vê malperê beşdarî kampanyayê bibin.

EMÎNE ÇAGIRGA, dayîka Cemîle Çagirga ku di 4'ê Îlona 2015'an de hat qatilkirin

Bila Erdogan ji polîtîkayên qirkirina jinê

WERE DARIZANDIN!

Ji bo 100 sedemî 100 hezar îmze

AKP'ê demekê digot wê Tirkiyê demokratîk bike, Tirkiyê bikin welatekî hiqûqê. Pirsa Kurd bi riya siyaseta navxweyî çareser bikin, dawî li êşkenceyê bînin û derbasî sîstema demokratîk a parlementeriyê bibin. Bi vî rengî hêvî dabûn gel. Di nava van hêviyan de wekheviya Jin û Mêran jî hebû. Dev ji wan hêviyan berdin, di nava 18 salan de desthilatdariya AKP'ê ji wê demê paşdetir çû. Bi Partiya Nijadperest a Tirkiyê re tifaq çêkir û rejîma faşîst a dîktatoriyê ava kir. Saziyên Dewletê xistin destê xwe. Çapemenî bêdeng kirin û azadiya ramanê tine kirin. Qada hiqûqê vala kirin û her tişt xistin xizmeta xwe.

Hikûmeta Erdogan çi kesê ku îtîrazek wî hebûya bi derfetên Dewletê ew tine kir. Muxalefetê bi mirin, girtîgeh, êşkence, koçberî û gefan tine dike. Tirkiye veguherand girtîgeheke servekirî. Di siyaseta derve de jî polîtîkaya şantajê bi kar tîne. Bi hemû welatên cîran re pirsgirêkên wî heye. AKP ku li pey xeyalên Neo-Osmanî ye rêxistinên wekî DAIŞ'ê bi kar tîne û êrişên dagirkeriyê li Sûrî, Iraq û Lîbyayê dike. Di têkiliyên navnetewî de şantajê dike û karê xwe yê qirêj dide ferzkirin. Welatê ku AKP'ê aniye wê astê niha ji her kesî re bûye gef û talûke. Hindik be jî ev rêveçûna xeter a li Tirkiyê di çapemeniyê de cih digre. Lê şerekî ku AKP dimeşîne û wekî qirkirin nayê dîtin heye. Ew jî şerê qirkirina jinan e.

Her ku polîtîkayên hukûmeta Erdogan êrişkar dibin, polîtîkayên qirkirina jinê jî zêde dibe. AKP bi van polîtîkayan re qira civakê jî tine. Desthilatdariya mêr ku bi faşîzmê xwe li ser piyan dihêle bi êrişên li ser jinan statuya xwe zêde dike. Li cîhanê herî zêde girtiyên siyasî yên jin li Tirkiyê girtî ne. Di dema AKP'ê de şîdeta li ser jinê ji sedî 1400 zêde bû. Qetilkirina jinê û şîdeta li ser jinê ne tesaduf e. Ev yek bi polîtîkayên Dewletê re têkildar e. Li deverên ku tên dagirkirin jin têne revandin, tecawuz li wan tê kirin, difroşin û qetil dikin. Li dijî îradeya jinê û jiyana azad êrişên plankirî tên kirin. Dixwazin jinê di bin desthilatdariya mêr de bifetisînin.

Li gelek deverên cîhanê û Tirkiyê tê dîtin ku jin muxalefeteke sereke ne. Bi taybetî bi pêşengiya Tevgera Jinên Kurd raperîneke jinan heye. Her roja derbas dibe ev raperîn mezin dibe û bi destê Erdogan jî polîtîkayên qirkirina jinê zêde dibin. Ev yek ne tesaduf e. Bi qirkirina jinê re dixwazin hêza muxalefet û guhertinê jî tine bikin û civakê dîl bigrin.

Qirkirina jinê hê jî sûcekî li dijî mirovahiyê nayê dîtin. Dewlet û Dîktator bi qirkirina jinê xwe li ser piyan digrin û dizanin ku ji ber van sûcan nayên darizandin. Heta ku qirkirina jinê wekî sûcê mirovahiyê neyê dîtin wê ji qirkirinên din jî ti encam neyê bi dest xistin.

Em ê bi vê kampanyayê qirkirina jinê ya AKP'ê nîşanî her kesî bidin. Bi vê kampanyayê re em ê bibin dengê jinan û sûcên heyî eşkere bikin.

Li Tirkiyê ku her rojê jinek tê qetilkirin, em ê bi kampanya xwe pêşî li vê qirkirinê bigrin.

Em bi kampanya xwe dixwazin ku AKP were darizandin û edalet bi cih were. Em dixwazin ku qirkirina jinê wekî sûcê li dijî mirovahiyê bê naskirin. Ji bo van daxwazan tu jî îmze bike û bi îmzeya xwe bibe dengê mexdûran. Rê nede qirkirina jinê.

ZEYNEP CANSIZ, dayîka Sakîne Cansız ku 9'ê Çilê'ya 2013'an de hat qetilkirin

web: www.100-reasons.org

mail: signatures@100-reasons.org

info@100-reasons.org

facebook: onehundredreasons

twitter: @100Reasons_

TJK-E (TEVGERA JÎNÊN KURD LÎ EWROPAYÊ)

www.tjk-e.com

international-relations@tjk-e.com